

# Dersa zimanê zikmakî

## Li Herne – Zanyarî ji bo dê û bavan

### Dê û bavên hêja!

Dersa zimanê zikmakî anku dersa zimanê welatê hûn jê hatî ji wan zarokan re ye, ew ên zanyariyên bingeşîn li ser zimanê xwe dizanin.

Em dixwazin we li ser bernameya xwe agehdar bikin.

### Çima pêwîste hûn zaroka/ê xwe ji bo dersa zimanê zikmakî tomar bikin?

Bi rêya dersa zimanê zikmakî dê pirzimanîya zaroka/ê we hête geşekirin û ew derfet jê re heye xwendin û nivîsîna zimanê xwe yê zikmakî/zimanê welatê jê hatî fêrbibe. Zêdebarî vê yekê, eger zaroka/ê we zimanê xwe baş bizane, dê fêrbûna zimanê almanî jî jê re hêsan bibe.

Li dawîya qonaxa navîn zaroka/ê we dikare başdarî ezmûna zimanê zikmakî bibe û wiha nota xerab ya zimanê inglîzî yan ya zimanê biyanî yê duyemîn li ser bawernameyê bide ber hev (baş bike).

### Zimanên heyn

- *Erebî*                      - *Kurdî*                      - *Îtalî*                      - *Polonî*                      - *Tirkî*

### Dem û cihên pêşkêşkirina dersan

Dem û cihên pêşkêşkirina dersan ji bo vê sala xwendinê hûn dê li [www.herne.de/hsu](http://www.herne.de/hsu) bibînin. Dersa zimanê zikmakî hefteyane sê heta pênc demjimêran e.

### Mamoste

Mamosteyên dersa zimanê zikmakî pêşkêş dikin, karmendên fermî yên herêma Nordrhein-Westfalen in.

Ew mamosteyên zimanê daykê ne.

### Agehî ji aliyê xwendingehê ve

Dema zaroka/ê we; ew a/ê bi pirzimanî mezin dibe, li xwendingehê tê wergirtin, hingî hûn wek dê û bav/ seymanên zarokê/î dê ji aliyê rêveberiya xwendingehê ve li dor dersên zimanê zikmakî li bajarê Herne werin agehdarkirin.

### Tomarkirin

Li dawîya sala xwendinê hûn dikarin zaroka/ê xwe ji bo sala bê ya xwendinê ji bo dersa zimanê zikmakî tomar bikin:

1. Forma „Interessensbekundung/vorläufige Anmeldung“ dagirin.
2. Forma we dagirtî, bidin sekreteriya xwendingehê.
3. Li despêka sala xwendinê dê tomarkirineke pêgîrîpêkirinê li cem mamosteya/ê zimanê zikmakî were encamdan (Formular „Anmeldung“).
4. Formên tomarkirina pêşwext hûn dê di lînkê li jêr de bibînin:  
[www.herne.de/PDF/Bildung/Vorl.-Anmeldeformular-HSU.pdf](http://www.herne.de/PDF/Bildung/Vorl.-Anmeldeformular-HSU.pdf)

### Zêdekirina zimanan

Hûn dikarin daxwaza zimanekî din yê ku heta niha ne di bernameyê de ye, bikin. Eger hejmareke guncayî ya xwendekaran hebe, bernameya zimanî dikare were berfirehkirin.

→ Qonaxa seretayî (1-4): herî kê 15 xwendekar

→ Qonaxa navîn (5-10): herî kê 18 xwendekar

# Dersa zimanê zikmakî

## Li Herne – Zanyarî ji bo dê û bavan

### Bawername

Mamosteya/ê zimanê zikmakî dê belgeyên beşdarbûnê bide xwendekarên polên 1-2 yê zimanê zikmakî. Ji pola 3. û ser de dê not hêne dan. Xwendengeha xwendekarê/î dê nota wê/wî li ser bawernameya wê/wî li jêr xala „Têbînî“ binivîse.

### Erkê amadebûnê

Xwe tomarkirin ji bo dersa zimanê zikmakî dilxwazî ye.  
Beşdarbûn erke ji bo kesên xwe tomar kirin.

### Ezmûna zimanî

Xwendekar dê li dawiya qonaxa navîn ezmûna zimanî encam bidin.  
Nota wan dê li ser bawernameya derçûnê were nivîsîn.  
Eger şiyarên pêdvî werin pêkanîn, hingî zimanê zikmakî li qonaxa amadeyî dikare wek domandina zimanê biyanî were bicihkirin.

**Ji bo pirs û agehiyên zêdetir em di xizmeta we de ne:**

### Serperîştîya xwendengehan

Rêvebera rêveberiya perwerdeyê Andrea Christoph-Martini  
Eickeler Markt 1, 44651 Herne  
Ode: 301  
Telefon: 0 23 23/ 16-33 56  
E-Mail: [andrea.christoph-martini@herne.de](mailto:andrea.christoph-martini@herne.de)

### Beşa rêveberiyê

Sebahat Düz  
Eickeler Markt 1, 44651 Herne  
Ode: 305  
Telefon: 0 23 23/ 16-34 50  
E-Mail: [sebahat.duez@herne.de](mailto:sebahat.duez@herne.de)

**Şêwermendiya pisporî ya entegrasyonê bi riya perwerdeyê:**

Sebastian Straschischnik  
Eickeler Markt 1, 44651 Herne  
Ode: 303 (Rêveberiya perwerdeya Herne)  
Telefon: 0 23 23 / 16-33 45  
E-Mail: [Sebastian.Straschischnik@herne.de](mailto:Sebastian.Straschischnik@herne.de)

Malwina Fuchsmann  
Eickeler Markt 1, 44651 Herne  
Ode: 309 (Rêveberiya perwerdeya Herne)  
Telefon: 0 23 23 / 16-37 19  
E-Mail: [Malwina.Fuchsmann@herne.de](mailto:Malwina.Fuchsmann@herne.de)

**Mafê daneriyê:**  
Sebastian Straschischnik